

Çima pexşana kurmanciyê gellekî maye derengiyê û hîn jî li vir hema hema tune.

Elî Paksirêşt

1-Nebûna perwerdeya fermî. Perwerdeya fermî her çiqasî zûtir bibûya, zimanê nivîskî û girêdayî wê jî pexşanê bi pêş ve biçûya. Wek mînak, di farisîyê da piştî ku Darulfinûn bi rêbertiya Emîr Kebîr hat damezirandin, zimanê farisî yê nivîskî teqle xwar û tevî wê jî nivîsîn ji teşeya pîranî helbestê derket û giraniya pexşanê zêde bû. Bêguman ev yek bin bandora çanda ewrûpî da lê erênî bû. Hejmara zêde ya berhemên nû – ku pîranî jî werger in – belgeyeke baş bo vê yekê ye û ev mijar di pirtûka (تاریخچه ترجمه) da bi berfirehî hatiye lêkolandin.

2- Gellekî dereng destpêbûna wergerên ji zimanên din li kurmanciyê jî hokareke mezin bo berfireh nebûn û xurtnebûna pexşana wê ye. Werger xwedana erkeke çend hêlî ye û hêleke wê ya girîng geşepêdana zimên e. Wek mînak heya ku nivîs an werger di warê fîzîkê da pêk neyê, pêdiviya hebûna peyvên têkildarî mijarên fîzîkê çênabe û deriyê vê qadê venabe û ziman di vê warê da kar nake û bi pêş ve naçe. Yan mînakeke erênî ew e ku kurmancan ser rêzîmên kar kirine lewma jî hem cihêrengî heye hem jî di warê têgehên rêzîmanî da kurmancî yek ji zimanên baş û pêşketî ye, lewma di navbera wergerê û geşepêdana zimên da têkiliyeke xurt heye. Di nivîsara Îbrahîm Seydo Aydoxan a bi navê (Werger û hin pîrsgirêkên wergerê di kurmanciyê de) bi awayekî gelemperî îşareyî vê mijarê bûye.

3-Nebûna alfabeya yekane. Ev bûye sebeb eger jî kesekî/ê xwestibe nivîsekê binivîse, yan bi alfabeya zimanê cîran yan jî bi zimanê cîranan binivîse, wiha hemû kurdan nikariye berhemên hevdu bixwînin û qad teng û kêmsînor maye, danûstandin çênabûye, carinan dubarekarî hebûye (wek mînak, gellek kesan berê Quran wergerandine bêyî ku haya wan ji hevdu hebe). Kurdan bi alfabayên erebî, ermenî, fransî, almanî, rûsî, latînî, ... nivîsîne (bo vê dikarin li pirtûka Hînbûna Zimanê Kurdî bi du Rênivîsan – Mûsa Qulîkî Mîlan binêrin) û ev astengiyeke mezin bûye û hîn jî wisan e.

4-Wêjeya kurdî ya nivîskî li mizgeftê dest pê kir û bi alfabeya erebî ye. Beriya Îslamê hebûna ti berhemên kurmancî yê nivîskî nehatine selimandin. Ji aliyên din va jiyana kurdan bi taybet kurmancan pîranî çiyayî bûye, yanê zozan, aran. Wêjeya nivîskî – jê pexşan – li her derê li bajaran yanê li cihê şaristaniyê çêbûye. Herwiha, di dîne êzidatiyê da – ku dîne kurdan beriya Îslamê bûye û piştî Îslamê jî dîne misilmanan jî hin tişt ketine nava wê – xwendin û nivîsîn heram bûye û ji ber ku gel bi taybet demên berê zêdetir girêdayî dîn bûn, lewma girêdayî gotinên pîr bûn – êzidî ji zanayên dînî ra dibêjin Pîr (Dikarin bo vê yê li vê nivîsarê binêrin: Wêjeya Kurmancî ji serdema Îslamê heta qonaxa Cizîrî. Herwiha ev mijar di romana Xezal`ê nivîsa Sîma Siyabend wergera Evdile Arxa da bi rengekî wêjeyî û zelal diyar e). Ev yek dikare bibe hokareke girîng a nenivîsîna kurmanciyê beriya Îslamê û hetanî Pirtûkên pîroz ên êzidiyan – Mishefa Reş û Cilwe – bi tîpên erebî ne, ev nişan dide nivîs tunebûye, eger hebûya, çawan ku kurdên êzidî – ku hemû jî kurmanc in – ser dîne xwe man ew ê ser alfabeya xwe jî bimana.

5-Ruhê eşirtî û qebîletiyê berê di nava kurmancan da pîrr xurt bû, ev yanê li gorî berjewdnyên eşîra xwe bipêşvaçûn û nebûna ruhê neteweyiyê û hebûna nakokiyên. Wê demê eger nivîskarekî kurd jî hebûya, jê ra hebûna fikra neteweyî bêwate bû. Ji bilî vê jî, di Îslamê da umeta îslamî ji qewm û netewe

û nijadan girîngtir bû – di çarçoveya fikra qedîm da – renga ji nivîskarê kurd ra girîng nebûye lewma jî Şerfxanê Bitlîsî (شرفنامه) û (هشت بهشت) bi farisî nivîsiye.

6-Her gelek xwedanê taybetmendiyeke ye û yek ji taybetmendiyan me kurmancan – ne hemû – ew e ku dibêjin lê nakin yanê tiralî dibe sebeb zêde yan jî carinan qet zehmet nekişînin.